

Derfetek din

»»» R:8



Enfala Kurd qiranê tu caran nayê jibîrkirin

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agiri

*Duhestînameyek Siyayî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (420) 21-04-2022 Buha (1000) Tûmen*

Tacava gundek geştyarî û ne-naskirî li Rojhilatê Kurdistanê ye

»»» R:5

Almanî ji Îslama Siyayî aciz in

»»» R:7

Leylana xweşderbasiyê

Elî Xamney, rêberê rejîma Komara Îslamî di heyama rojên derbasbûyî de weke pîşeya hertimî a xwe, bi hewldan bona xalyê li nav çavên xelkê bike ragihand ku:

Tevî dorpêçan aborî, Îranê şikest nexwariye û berewajiyê texmînên biyanyan, Îran rût nebûye û her ev yeka jî wisa kiriye ku Komara Îslamî bibe mînakek xuya di cîhanê de ku rastî deynan nehatiye. Mînakek ji xelkên din hêviyan bo dixwazin! Û Dibêje jî: welatê me tevî wan dorpêçên aborî û givaşan, tûşî deynan nebûye! Di wê halî de jî dibêje ku: Eger em nehatiban dorpêçkirin niha me nedikarî ji xwe re vaksîna dije vîroşa Koronayê çê bikin!.

Ev axavtinên wî di halekê de tînin bihiştin ku: Pêka amarên banka Navendî a rejîmê bixwe, Îran bi qasî 8 milyar Dolarî deyndarê derve ye û 277 milyar Dolarî jî deyndarê hûndire û dewlet bi qasî 165 Hezar milyar Tûmenî bi banka Navendî û herwisa bi qasî 587 Hezar milyar Tûmenî jî bi bankên din deyndar e!

Êdî behs kirina ji vê beşa axavtinên Xamney ku dibêje aboriya me şikest nexwariye vê bo karnasên rejîmê bixwe dihelin û yek ji wan Musa Mîrcehanmerdî serokê Avahiya Kedkariyê li bajarê Bûşêhrê ye ku dibêje: Civaka Îranê ji

sedî 70 şiyana dabînkirina hewcehiyên xwe nînin! Êdî pîrsa nexweşiya Koronayê û vaksînek ku navbirî şanaziyê pê dike ev her di cihê xwe de ye ku, netenê nekariye kontrol bike belkû, bûye sebebê serekî bo rûtbûna zêdetir a sermayedaran û hejartir bûna xelkên çîn û texên hejar û kêmdahat.

Bi awayekî ku sernûçeyên amar û raporên aborî yên bankên navendî û dezgehên hikûmetî behsa vê yekê dikin ku, aboriya Îranê bi awayekê berdewam di halê daketîna de ne. Ji bo mînak dawîn rapora dezgeha binav Bername û Bodceya Komara Îslamî hişdarî daye ku, eger pêkhate û girêçînên aboriya Komara Îslamî pêdaçûnên micid û bingeîn û zaniştîyane li derheq vê de neyên encam dan heya sala 1403'an digihîje sînûrê rûtbûn û bi demdirêjbûna dorpêçan jî, Dola heya sala 1406'an deh hember ji ya niha girantir dibe!

Diyare girantir bûna Dolar berambere digel girantirbûna hewcehiyên jiyanê bi gîştî.



An dawîn rapora lêkolîna odeya bazirganî a Îranê cihê baldanê ye ku dibêje: “Bilindbûna nirxan û kêma îhsaskirina bi nexdîniyê, wisa lê kiriye ku rêjeya kirîna hewcehiyên jiyanê di heyama sê mehên derbasbûyî de bigihîje asta herî kêma xwe bi texmînkirina vê ya digel 7 mehên derbasbûyî de”.

Amarên Wezaretê Kar jî dane xuyakirin ku nîva nirxan zêdetir ji sedî 83 a hewcehiyên xwarina rojane a xelkê li sînûrê kirîzê derbas bûne û xelk bona dabînkirina wan deşt vala mane. Îca mirovek wekî Îbrahîm Re'îsî jî heya êvarê bila biqîre û ku bo çareserkirina bingeîn aboriyê amadeye! Şerefa xwe bike garantî! Lê, Re'îsî her şeref tune ye û dewleta wî û ya xamneyî jî, ne dibin bi nan û ne dibin bi av û ne jî dibin bona berdewamiya jiyanê di Îranê de.

Pirseke girîng a din

ku divê navberê de divê îşare pê bikin ev jî hewla sistematîk a hikûmeta di bin rêvîniyên mirovekî wekî Xamney ku, bi awayekê berdewam hewl dide leylandek li ewlehî û xweşderbasiyê bo xelkê ders bide û ev bixwe û dezgehên bînav kabîneya wî, yek ji wan jî Dengûrengê Komara Îslamî ye ku, hewl didin xenêya kal û bêreng li serê xelkê lêqewmî bidin û ji wan re bidin erê kirin ku dahata me gelek geşe û divê çavnehêr û hêvîdar bin!

Bo mînak Xamneyî di hevdîtinekî digel beşek ji birêveberên Dezgeha Wîlayetê li rêkefta 23'ê Xakelêweyê de dibêje: “Dilxweş bin ku aborî tenê pêvereke û ne tiştek din.

Hûn dibe ji wan dersên raşteqîne bin ku heye, em xwediyê hinek aliyên bihêzin ku serê me bilind ragirîne!

Yek ji wan hebûna ew-

lehiyê ye û pel havêjtina stratîjîk a me li herêmê de ye bitaybet di warê berfirehbûna meî'newî de ye! Ku wan Komara Îslamî kirine mînakek baldan û tekbûn”. Xuyaye mebeşt navbirî ji pel havêjtina hêza stratîjîk li herêmê de, piştevanîkirinên Komara Îslamî ji girûp û milîşên girêdayî bixwe ye di welatê Yemen, Îraq, Lubnan û Sûriye de ku, hem bûne cihê malwêranî û koçberbûna dehan milyon mirovî û hem jî wêranbûn û alozbûna wan herêmên ku, girûpên girêdayî-Tehranê vir hene, ev jî bi serwet û saman xelkê Îranê.

Eger deştêverdan di karûbarên navxweyî yên welatên din de û hewldan bona çekirina alozî û şer bona ne aramkirinê, nîşaneya bihêzbûn û nifûza me'newî bibe dema ku wisa ye, ev xelkên ku li ser şeqamên Bexda û Besre û li başûrê Îraqê êrîşî li ser binkeyên Tehranê dikin û alaya rejîmê û wêneyên rêberên Komara Îslamî agir ber didinê çawan tînin pênasekirin?

Bi ji berçavgiritna wan raştiyan digihîjin vê encamê ku, ya ku Tehran bangeşe yê bo dike netenê ti peywendiyek bi raştiyê tune ye belkû, tenê hinek drevîn bona çekirina leylandek ji hêvîdanê bi xelkê daku di jiyanê xwe de berdewam bin! Jiyanek ku heta li ser lêvan cemserî û pîrsgirêkên paremayî ne ku, bi xatir cemî ve berdewam bûna vê rewşê di tevwarên jiyan û li serweyî hemûyan aliyê aborî ku, rasteraşt û nerasteraşt şûnê li ser warên din yên jiyanê dadinê û wisa lê dike ku, jiyan wateya raşteqîne a xwe di Îranê de vala bibîne.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Di heyama rojên derbasbûyî de, Artêşa Tirkîyê di dirêjahîya êrîşên xwe yên berê li dijî axa Herêma Kurdistanê û li dijî hêzên Partiya Kedkarên Kurdistan (PKK)ê, beşeke din a êrîşên xwe ên bi navê “Pençe-Kilid” dest pê kiriye.

Di peywendîya digel şerê nû de, dezgehên Îtîla’atî û herwisa nûçegihan û medyayên girêdayî rejîma Komara Îslamî kevtine vegerê û di vê navberê de dixwazin, berjewendiyên xwe yên nehs dabîn bikin.

Yek ji wan helwestan ku belav kirine, ev nîqaşe bû ku dibêjin di vê alozî û şerî de, hem hikûmeta Îraqê û hem jî hikûmeta Herêmê dibe givaşan bixine ser hêzên çekdar yên neyasayî û wan çek bikin. Ji ber ku ev hêzên han ewlehiya herêma wan xistîne metirsiyê, ewlehiya Îranê li herêmê li navçeya rojava û bakurê rojavayê Îranê bi destê hêzên çekar bi qewlê wan cudahîxwaz (tecziyeteleb) kevtîye metirsiyê.

Li kiryar û karên siyasî û leşkerî di cîhanê de, gelek caran cihê tawanbar û qurbanî tê guherîn û yê ku tawan afirandiye û rûyê dîrokê reş kiriye, sîmaya zilmlêkirî li xwe digire û aliyê qurbanî jî weke tawanbarê dije mirovahiye nîşan dide! Her di wan rojan de, hûn dibînin ku ji ber çavên tev cîhanê, Rûsyayê êrîşî ser Ukraynê kiriye, lê di propagandê de dixwaze wisa nîşan bide ku, Rûsyayê bûye qurbanî û bo bi hawarçûna xwe ve penaha xwe bo şerê taybet biriye!

Hêz û rewabûn



Dema ku desthilatdar pêka lojîkê hêzê dimeşîne, êdî wisa hesab dike ku li her cihê mûşekê giran lêxişt an gurê çeka wê bihêztir bû, êdî eva rewabûn bi wê ye, û dikare çîrokan bi dilê xwe li ser bûyeran behs bike.

Pêka vê lojîkê, çîroka rast û heqîqet cem xwediyê çekê ye û hêza çekê netenê di şer de serkevtî dibe, belkî heqîqetê jî destkarî dike û heqîqetê jî dibe!

Dev ji vê berdîn, pêka vê lojîkê dibe ku Xamneyî şuxwarê gotinên heqîqet yên Amerîka û Îsraîlê bibe, çimkî hêza wan zêdetire!

Tehrana êrîşber li ser fermana cîhadê hatiye axa Kurdistanê dagîr kiriye û herwisa Spaha Pasdaran a terorîst ku spaheke dagîrker û koloniyalîst e, bi pêlavên pûtîn li ser şuyê xelkê, desthiladariya tepeserkariyê bi rê ve dibe, hatiye dibêje ev kesên ku nabin bi şuxwarê wê desthiladariya zilmkar, terorîst in û wan ewlehiya xelkê Îranê xistiye metirsiyê!

Li cem çek û mûşekên Komara Îslamî tiştê bi navê rewabûn nîne heta ku bi dilê xwe heqîqetê binivîse, belkî rewabûn cem hêza xelkê ye.

Ew Tehrana ku ji Cemarana xwe ve, banga serberediyê lê derdikeve û îdiaya zilhêziyê li deverê dike, bi hebûna Hêza Pêşmerge Kurdistanê ewlehiya wê rastî metirsiyê hatiye, hemen Tehran e ku heyamek berî niha digot, hêzên Kurdî an bi qewlên wan cudahîxwaz şûna wan jî nemaye û ji nav çûne û wan di Kurdistanê de ewlehiyek tevav heye!

Rasana gel, zindîbûn û vegerxistina hêza gel e ku kiryarek dije ewlehî bo ser xelkê nîne, belkî hişyariya gel e ku xew li çavên dîktatorên Tehranê revandiye.



Enfala Kurd qiranê tu caran nayê jibîrkirin



N: Nûredîn Sofîzade

Mixabin dema em dîroka pir ji xwîn û qurbaniya gelê xwe dinêrin, rûpelên wê tijîne ji tomar kirina tirajîdiya, bûyer û komkujiyan, û giraniya hinek ji wan bûyeran birîneke mezin li ser dilê hemî netewa me çê kiriye. Wekî komkujiya Dêrsimê, komkujiya Araratê, Geliyê Zîlan, Ferma-na cîhadê ji aliyê Xumeynî ve bo komkujiya gelê me li Rojhilatê Kurdistanê, bombebarana kîmyayî a Helebçe, yan girtin û bêserşûn kirina 200 Hezar kes ji gelê me li Başûra Kurdistanê ji aliyê hikûmeta dîktatora Îraqê ve li jêr navê Enfal de.

Belê Enfal yek ji tirajîdi-yayên herî mezine ku, dijmi-nan bi serê Kurdan de aniye.

Di dirêjiya komkujî û cinay-etên li dijî gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê de, sala 1986'an rejîma Îraqê bi serkomarî û fermana Sed-dam Husên, piştî dawîpêha-tina şerê digel Îranê, hêzeke mezin sand li ser Başûrê Kurdistanê û gelek bêrehm-ane û hovane ew cinayeta li dijî mirovayetiye bû afirand.

Armanç ji wê êrîşê girtin û kuştina hemû mîrên Kurd ên ji 10 salî sertir bû. Bo wê ku bikare armanca xwe big-ehîne cî, li destpêkê de xelkê hezaran gundan bi destê zorê girtin û xistne kempên ku pêşda amade kiribûn, gund şevitandin talan kirin, çavkaniyên avê çikandin, bi bomebarankirin û makîneyên weke, Loder û Bordizêlan heçî avahiyên wan gundan herifandin.

Ev cinayet, wêrankarî, gir-tin û xistina Kurdan bo nava kempên destê zorê de, heya 3'ê salan dom kir û êdî bi



yêkcarî jiyan li Başûrê Kurd-istanê de, ji nav birin, heya bihara 1989'an vêca dest-kirine jihev weqetandina jin,

mêr û zarokan di nav kemp- de.

Piroseya cinayeta li dijî Kur-dan ya li jêr navê Enfal de, û cîbicî kirina wê li çendîn qonaxan de ku dest pê kir, li destpêkê de 8 hezar mîrên barizaniyan girtin û birin û bê serşûn kirin, piştî hingê li de-verên Germiyan û navçeyên din de, 182 hezar kes girtin û birin û bê serşûn kirin.

Di wê cinayeta bi navê En-falê de, li dijî Kurd û Kurdis-tanê, 4665 gund bi awayek tewav hatin jinav birin û digel erdê kirine yek. Çendîn bajar bo mînak, Qeladize û Seydsadiq wêran kirin û heta malek jî nehêlan. Ev cinay-eta ku bi navê yek ji Ayetên Quranê bi navê Enfal li dijî Kurdan hate encam dan, pitir ji 3 hezar mizgevt herifandin, pitir ji 2 hezar qutabxane 300 nexweşxanan herifan-din, bi milyonan terş û pez û heywanên Kurdistanê talan kirin, Bi milyonan Kurd ji çol û çiya kevtin û bûyerên dilêş û tirajîk li serê wan de hatin, rê , pire, çavkaniyên avê, elektrîk, li Kurdistanê hemî jinav birin.

Ev jînosayda han ji aliyê rejîma Îraqê ve ku li jêr navê Ayata Enfalê li dijî Kurdan destpê kir, Enfal bi wateya Xenîmeta şer e, anku Sedam Husênê dîktator ferman dabû cinayetkarên xwe ku êrîşî li ser kurdiştanê bikin, mîrên

wan heta yên ku destê wan dar bigire bigre û bikujin, malên wan xerab bikin, heyî û neyî ya wan talan bikin, û jin û keçên Kurdan bi xe-nîmet bigirin û bibin, û heta dikarin bibin li Başûrê Îraqê bifroşin, her ew bû ku he-zaran keçên Kurd derbasî welatên Erebbî kirin û wekî kenîz firotin.

Piroseya Kurd qiranê û En-falê her di sala 1983'an de destpê kir, lê, demekê ku şerê bê encamp ê digel Îranê dawî pêhat, rejîma Îraqê bo matki-rina dengê nerizayetiya xelkê Îraqê û weşartina şikesta di şer de û qerdariya bi milyar-dan Dolarê ku li şer de miza-xte kiribû, êrîş û komkujiya li ser kurdiştanê û birê ve birina cinayeta bi navê Enfalê, bo xwe bi çareser dizanî û hovitî û aştî bilinda wê jînosaydê di sala 1986'an de lezgînî bi xwe ve girt û sala 1989'an de trajîdiya ya mirovahiye encam da.

Piştî sernixûniya hikûmeta dictator a Be'eîs a Îraqê di sala 2003'an de, eşkere bû ku hemî ev Kurdên ku di qonaxên bi navê Enfalê de girtin û birin û bêserşûn kirin, li sehra û biyabanên naverast û başûrê Îraqê de li gorên bikom de zinde bi çal kirine û hikûmeta Herêma Kurdistanê karî rufatên parek ji wan weguhuse bo nava axa Kurdistanê û mixabin heya niha jî, gelek yan hela mane û yan nehatine peydakirin.

Ewa ku ji birîna kûr a kom-kujiya Enfalê li ser dilê Kur-dan eş û azara wê hebû, ew bû ku di demekî wiha de û

li hember wê cinayet û jîno-sayda ku Hikûmeta Îraqê û Sedam Husên bi serê Kurdan de anî bû, welatên cîhanê û bi taybetî Rêxistina Netew-eyên Yekbûyî, Amerîka û Ewropa ku gelek basê mafê mirov û demokrasiyê dikan, ne guhê wan dengê qîrîna zarokên kurdan dibîhîst, ne çavê wan ev cinayeta li dijî mirovahiye didît, ev li hem-berî wê jînosaydê de bê deng û bê helwêst man.

Piştî derbasbûna 33 salan li ser wê cinayet û komkujiya bi navê Enfalê de, niha jî mixabin ev welatên ku xwe pêşengê mafê mirov diza-nin û xwe li enya şerê li dijî dîktatoriye de didin nasand-in, amade nînin wê kuştara bi kom a sedan hezar kesî ya Kurdan weke jînosayd bina-sin û tomar bikin, niha jî ew bê helwêstî û piştguh havê-tina bi jînosayîd nenaskirina cinayeta bi navê Enfalê, dilê birîndar ê hemî Kurdan azar dide.

Parlemanê Kurdistanê roja 14'ê Nîsanê wekî roja reş a Enfalê diyar kiriye ku hemî salê di wê rojê de nêzî 200 hezar şehîdên bê berevan ên Enfalê bîr vebîranîn. Netenê di 14'ê Nîsanê de, belkî hemî rojekê Kurd qirkir-in û komkujiya li ser xwe bi bîr tîne.

Aliyê kêr ya ku bo hemî cîhanê û ji dost û dijminan re eyan û îsbat bûye ewe ku, ne jînosayd û komkujiyê ne kavilkirina Kurdistanê, ne bombebarana kîmyayî, ne tu fitwayeke Kurdqiranê û Enfalê, nekariye pêşiya doza berheq a Kurdan bigire û li dawiyê de yê ku li qadê de dimîne her Kurd e û yê dikevne nav kulfengê dîrokê û jinav diçin dîktator û du-jminên Kurdanin.

Silav li ser riha hemî şehîdên Kurd û Kurdistanê, em tu caran wê xedr û jînosaydê ji bîr nakin, û tenê yekîtî û xebat bo gihîştina tewahiya mafê gelê Kurd e ku dikare armancên şehîdan bideşt ve bîne û riha wan şad bike.

Bandora mirov li ser jîngehê

N:Nîştiman.Urmiye

W: Hesen Mukerem

Jîngeh kom sebebên fîzîkî, civakî, aborî, kultûrî û estetîkiyê ku li ser takan û civakan bandorê dadinê û ji vê bandorê verdigire, bi gotinek din li ser çalakiyên mirovan jî, bandorê dadinê û weke yek ji pêkhateyên giştî di siyasatên mezin yên navneteweyî yên welatan de ye û herwisa nîşaneyên herî girîng ên weke nîşaneyên aborî, civakî hêza leşkerî, siyasatên derve û navxweyî û ... hwd bandor dike.

Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ku, lihevhatina jîngehê dikare ji bo pêkhateyan û çalakiyên mezin bibe bîngeh û şert ku, weke pêkhateya materyala nehevsengiya berfireh li ser riya pêşkeftina domdar derdikeve holê.

Digel vê komîsyona cîhanî ya jîngehê û pêşveçûnê li sala 1398'an de ku pêk hat, gihîştin bi vê encamê ku li astên neteweyî, herêmî û navneteweyî de dinavbera aborî, ewlehî û mijarên jîngehê de girêdaneke mîcîd heye lê, derbeyên ku bi awayên rojane di asta cîhanî de li jîngehê dikevin ev demke ku ji dûr ji çavan maye û piraniya xelkê ewqas guhnadin pirsigirêkên kujer yên jîngehê yên ku li derdora wan de hene.

Mirov dikare bêje ku: Jîngeh û însan bandorên hevpar li ser yekîtr hene, mirov her tiştê ku daxwazkiriye jîngehê ji wî/ê redaye.

Lê, mirov bi her awayî ku daxwazkiriye, pêka meylên xwe li jîngehê sûda xwe wergirtiye lewma, ev rûbirûbûna her tişt li hemberî ti tiştî de bûye.

Herçiqas mirov pêşkevtiyê û di jiyana mirovan de zanistê pêşkevtinê bêmehpa hebûye, bi hemen qasî êş û derdên duhembar li ser jînge-



hê çê kiriye, êşên demdirêj ku di paşerojê de dîr de ku, di paşerojê de nêz de jî, pêsîra nîfşên paşerojê yên însanan bigire û pêşveçûna berdewam di depresyonê de bi kirîzên kûr ên biyolojîkî re rû bi rû dimîne.

Mirov pêka tevger û ramanên jîngehê, bixwe jîngehê dixîne bin bandora xwe de, herçiqas pêşkeftina wî bigihîje bi qonaxên jorîn, ramanên di xwezayî pir rengitr dibin. Û biyoterora jîngehê bêhîtr û navûdengitr xuyîya bûye. Bi gotinek din encama wan veguherînan, jîngeh veguhertiye bi koleya hizirên mirovan.

Loma, roleke mirovî ya wiha dikare bermahi-yên derdora rê bigire heta hilweşandina bermahi-yên nehilweşîn yên di dilê xwezayê de. Ji politîkayên birîna dariştanan û çolkirinê bigire heta tozê, ji valakirina serçaveyên avê yên binêrd û şorbûn û pîsbûna xakê heta pîsbûna avan û ... hwd nîrxandine ku, ku biryarên wêrankerên mirov di rû bi rû bûna digel jîngehê de birê ve dibe.

Piraniya encamên wan

çalakiyanin ku, însan bi taybet di sedalên berê de, di rêya gihîştin bi pêşveçûn û asayêşê de, di heyama piroseya pîşeyî bûnê de, dest bo biriye û bûye sedema wêrankirin û pîsbûna jîngehê.

Ku, her ev nexweşiya demke dirêje, wiha tendrustiya însan xîstiyê metrsiyê de.

Loma, ev politîkayên wêranker ku encama wan nîfîşa niha û herwisa di serî de paşeroj ku qurbanîyên sereke yên pêşvebirina terorîzma rewşenbîriya mirovî ye.

Di raştîyê de pirsigirêk û arîşeyên jîngehê peywendî-yeke berfire digel kom-bûna sermaye û şewaza dabeşkirina serwet û asta pêşkevtin û asayêşê ye û herwisa lawaziya pîlanên stratîjîk di seçaveyên jiyan û ... hwd ye. Lê, dîsan jî, pirsigirêka hawrdorî hîn jî ji hêla sazîyên biryargir ve wekî pirsigirêkek giran tê marjînkirin.

Zîgmûnd Firoyîd li ser vê baweriyê ye ku, rakîşandina jîngeha derve, mirov dikare beşek ji hemen şewaza mirovan bona sepandina daxwazi-

yên xwe ji jîngehê re pêşeng bibîne. Loma, Firoyîd li ser vê baweriyê ye ku, çawanîya şarîstaniyet û pêşkevtina civakê netenê girêdaiyî sûd wergirtin ji jîngehê ye belkû, hinek aliyên bihêz yên wêranker girêdaiyî xwezaya derûnî ne jî.

Aliyên ku di mijara serdestiya mirovan de, cewhera derve ji hêla komên qazanc û sermayeyê ve kêmitr e.

Helbet ne ji ber vê yekê ye ku, mirov teslîmê pîvanên xwezayê yên derve bûye, an jî ji pîvanên navbirî rehm kiriye lê, ji ber ku mirov bi kontrolkirina cewhera xwe ya hûndirîn kêmitr bindestê xwezaya derve de dibe.

Ji ber ku, derdor herçiqas daxwazên bêdawî yên însanan bi cih bîne, ewqas jî li hemberî însanan tola xwe hildide. Mînaka gelek zelal a vê yekê zuwabûna gola Urmiyê ye ku, faktora sereke ya jinanvbirina rêveberiya nebaş û revandina neyasayî ya mirovan e.

Eger bandora wêranker a wê li ser jiyana xwecihên herêmê û jiyana wan bandoreke wêranker û bê control dike.

Tacava gundek geştyarî û nenaskirî li Rojhilatê Kurdistanê ye



N: Bêhzad Qadirî

Gundê “Tacava” gundeke Kurdane û girêdayî bajarê Behar a ser bi parêzgeha Hemedanêye û li Rojhilatê Kurdistanê hilkeftiye. Heşîmeta wî gundî, pêka ştatûya sala 1385’an, 1855 kes bûye û heta niha heşîmeta wî gundî, vegeşîneke berçav hebûye.

Gundê Tacava li rojavayê parêzgeha Hemedanê û li bajaroka Behar a li rojhilatê gevriya Esedavayê û li nêzikî rêya dinav bera Hemedan bo Kirmaşanê û li dawîn çiyayê vir hilkeftiye Zimanê ax-avtina wî gundî kurdî ye û karwanseraya Şa Ebasê Tacava, yek ji taybetmendiyên geştyaran e.

Çend tiştên girîng û taybet yên din li gundê Tacava de hene ku, navûdengê wî gundî zêde derxistiye, û herwisa yekek ji wan navên kolanên wî gundî ye, ku navê pirtûkên girîng yên cihanî bi sê zimanên Kurdî, Farsî û Îngilîzî li ser hatine danîn. Tevî ku ev gunda li parêzgehekê de ye û Fars û Turik vir cihgîr kirine, û kultûra zala wan neteweyan li ser xelkê wê herêmê de, xelkê wî gundî heta niha bona berevanîkirin ji kultûr û zimanê dayîka xwe li hewld û têkoşînan de ne.

Herwisa gundê Tacava, pirtûkxwenayek heye ku, xwediyê 6 hezar pirtûkane û ji aliyê saziyeke medenî hatiye damezirandin. Ew taybetmendiyane û çendîn taybetmendiyên din ku, di berdewamiyê de emê li ser nîqaş bikin ku, ev gunda kiriye gundekî geştyarî.



Berê Tacava, navenda mosîqaya wê herêmê bûye û jenyar û ştranbêjên navûdeng yên zêde virda derkevtin e.

Ew helbestên ku niha di wê herêmê de bi zimanê Kurdî mane, nîşana girîngiya wê hunerê ye ku virda hebûye. Berê hunermendên gundê Tacava li pîraniya herêmên Kurdî de kesên navûdeng bûn û li pîraniya rêûresmên wê serdemê de beşdar bûne.

Rêûresmên weke govend û cejinên din û herwisa çendîn rêûresmên din ku, virda hatine jibîrkirin kom hincet bûn bona xwe derxistina hunermendên wê demê.

Pîraniya xelkê gundê Tacava, mejûlî karûbarên cotyarî û ajeldariyê ne. Herwisa heta dehkên 80’î de, zêdetr ji 100 “Tevn” li gund de çalak bûne ku pêka xerîteyên xwecihî, ferş diraçandin. Lê, îro ev 100 Tevn heta 20 Tevnan kêmkirîye, û ferşên nû pêka xerîteyên biyanî ku ji bajarê Tevrêzê ve hatine, tên girêdan û xerîteyên xwecihî jinav çûne. Herwisa deştçînînen din yên di wî gundî de jî navçûne û rûnştîyên wî gundî, jê dûr kevtine.

Ajeldariya gundê Tacava bi lezgîniyek li halê jinavçûnê de ye, heta cihekê ku li sala 1386’an heta sala 1388’an, ajelên malî yên wî gundî, ji 6 hezar hebî bo 800 hebî kêmkirîye. Rêjeyek zêde kêmkirîye rûnştîyên wî gundî li rêya ajeldarî û cotyariyê dahata jiyana xwe dabîn dikin. Berhemên sereke yên wî gundî genm û ceh e. Herwisa

Tirî, Badem, Xox û Nîsk, ji berhemên din yên wî gundî ne. Xelkê wî gundî kurdin û tevî karûbarên ajeldarî û cotyariyê, bo kedkarî û karûbarên din yên weke zêdeyî herêmên din yên kurdên rojhilatê Kurdistanê, beraxwe didin bajarên din yên Îranê yên weke Tehran û Îsfahan.

Herwisa gundê Tacava potansiyelek baş a din a geştyariyê jî heye: Karwanserawa Tacava, navûden-gitrîn karwanserayên grow-er yên Kurdistan û Îranê tê hesabkirin.

Ew karwanseraya li sala 1376’an bi hejmara 1872’an weke mîrat navê wê hatiye tomarkirin. Karwanserayan li tev serdemên dîroka Kurdistan û Îranê de, roleke girîng hebûne.

Di dirêjahiya dîrokê de, kesên wisa hebûne ku, di wan karwanserayan de bona mana xwe û ajelên xwe ku wê serdemê amûrên hatinûçûnê bûne, mifah jê wergirtine, û wê serdemê navê “Rebat” li ser bû ye.

Edetên çekirina karwanserayan, çi liserdema îslamê û çi jî piştî serdema îslamê li Îranê de rewac bûye û piştî îslamê jî karwanserayan cih û pêgehek baldar li Îranê de hebûn. Karwanseraya Tacava jî yekek ji karwanserayên bedev û taybetmendiyên piştî îslamê ye ku, li serdema deştîlatdariya Sefeweyan de li ser emrê “Xatûna Cihanî a Qacar” û jî neviyên “Fethelî Şa” û “Hacîmîrza Elî Neqî Kevseri-

yê Hemedanî” li gundê Tacava ya Hemedanê de hatiye çêkirin”.

Ew karwanseraya li beşa navendî ya gund de hilkeftiye. Karwanseraya Tacava di raştiyê de, “Rebat” bûye û berewajiyê pîraniya karwanserayên Îranê ku xerîteyêke “Lakêş” ya wan heye, ew karwanseraya xerîteyêke “girover” heye. Ew core xerîteya di nav karwanserayên Îranê de gelek rind û bedevê û li rojhilatê Kurdistanê de, weke yek ji girîngtrîn karwanserayan tê hesabkirin.

Deriyê hûndirbûna wê avahiyê ji aliyê rojhilat ve dîmenek modern heye, û rêya bona hûndirbûna nav govan û hucreyan, ji aliyê rojavayê hilkeftiye. Li berahîka wê karwanserayê, 26 coreyên hucreyan hene. Herwisa eyvana wê tev helan kerîye û du bîrên avê vir da hene.

Amûrên sereke yên binasaziyê yên ku bona çêkirina wê karwanserayê mifah jê hatine wergirtin, heriya sor û sarûc e.

Li sala 1388’an de, deştûra nûjenkirina karwanseraya Tacavayê hat dan.

Pêka vekolînên wê serdemî û mezinahiya wê karwanserayê, bodceyêke zêde hewce ye bona nûjekirinê lê, rejîma Îranê bodceyek bi qasî 70 milyon Tûmenî bona nûjenkirina wê karwanserayê deşt nîşan kir! Û her bi sedema kêmbûna pere jî, tenê beşek ji pêkhatiyên heriya derveyî ya wê karwanserayê hate nûjenkirin.

Krîza avê

N: Namô

W: Hesên Mukerem

Îran welateke xwediyê kêş û hewayeke germ û hişk.

Di sedlsalên derbasbûyî de vegeşîna lezgîna heşîmetê, girîngitirîn sedema nizimbûna seraneya avê bûye.

Heşîmeta Îranê di heyama 8 dehkên derbasbûyî de nêzî 80 milyon kes bûye û heta dawîya sala 1396'an jî gihîştîye 81 milyon kesî.

Di dawîya sala 1381'an de hate ragihandin ku, nîva heşîmeta Îranê deştpêragihîştina bi ava vexwarinê tunînin.

Kirîza avê li Îranê de, di bin bandora sê sedemên sereke de ye:

1- Vegeşîna lezgîn û mod-ela negoncav a cihgîrbûna heşîmetê.

2- Cotyariya ne standard.

3- Nebûna birêveberiya kêrhatî.

Di heyama sala derbasbûyî de, bona gihandina ava vexwarinê bo 8405 gund û herêmên bajarê Îranê, ji tankêrên avê mifah hatiye wergirtin. Herwisa 304 bajar li rewşa zihabûna avê de ne û 101 bajar jî rewşa sor de ne li derheq a ava vexwarinê.

Bi teximîn lêdana digel sala 1398'an, li 6 serçavên ava Îranê, ji sedî 52 rêjeya barînan kêmkirîye. Li herêmên rojhilat û navenda deşta Îranê de, barîna nixteyan ji sedî 53 kêmkirîye. Herwisa bakurê rojava û serçaveyên gola Urmiye liçav cihên din yê Îranê rewşa wê baştr bûye.

Ev yeka bi wateya koçberbûna bi milyonan xelkê herêmên bê ave bo herêmên kêmkirîye di heyama salên derbasbûyî de.

Her piştî kêmbûna ji sedî 60 ava bendavan, birêveberên avên Îranê li derheq dabînkirina

rîna ava vexwarina 500 bajar-
ran de hişdarî dane.

Pêka rapora govare navûdeng a "Nîçêr", Îran di navbera salên 2002'an heta sala 2015'an de, nêzî 74 kîlo-
metran sê car li avên binerd yê xwe hilêncave. Her kîlo-
metrek sê cara avê, bermabere digel yek tirîlyon lître av.

Encamên mezin yê kirîza avê bi vî awayî ne:

- 1- Hişkbûna talavan
- 2- Hebûna pîrsgirêkan di tev kirdarên jîngehî, civakî û aboriyên êkosîstemên çalak de.
- 3- Daketina bilez a asta avên binerd,
- 4- Herfîna erdê.
- 5- Zêdebûna babelîskan.
- 6- Kêmbûna bilez a derfetên welat bona dabînkirina ewlehiya xwarinê.
- 7- Koçkirin
- 8- Nerizayetiya berbelav û tundîtîjiyên civakî.

Sedemên sereke yê rûdanên kirîzên mezin yê avê bi wî awayî ne:

1- Tekezkirina li ser birêveberiya hilêncandina avê bi bê baldan bi birêveberiya daxwazîyan.

2- Kêrnehatîbûna sîstema aboriya avê.

3- Tekezkirina bêsînûr a li derheq avên ser erd û bal nedan bi birêveberiya avên binerd.

4- Kom yasayên negoncav yê birêveberiyên berdewam yê serçaveyên avan û pejrândina koma pirojeyên vegeşînkirina cotyariyê, bi bê jiber çavgirtina deştên êkolojîk yê serçaveyan.

5- Pêşnekevîna sûdanên ji ber berhemên cotyaran û şewazên avdaniyê.

6- Tekezkirinê bêsînûr li ser birêveberiya pêkhate, bendav, kanal û dameziravên veguhas-tina avê.

7- Ji berçav negirtina bandorên çekirina bendavan li ser serçaveyên avên binerd.

8- Nedana pişka ava jîngehê.

9- Bandora watedar a kom-

paniyên endazyarî û sozderan li ser siyasatên birêveberiya serçaveyên avan.

10- Vêdebirina nîrxên civakî û jîngehan û herwisa vegeşîna hemû alî ya sîstema siyasîdanînen birêveberiya serçaveyên avan.

11- Bal nedana giştî bi deştên civakî yê beşdariya xelkê û li deştana deştîlat û samanên civakî yê li warê avedaniya serçaveyên avan.

12- Kêrnehatîbûna sîstema vegeşînkirina welat li derheq pîşeyîbûn û neafirandina hêlên kar di wî warê de, û di encamê de givaş xistina li ser çavkaniyên siruştî bona bideştveanîna dahata jiyanê li bazneya cotyariyê de.

13- Vegeşîna newekheviya şariştaniyet û herwisa givaş xistina li ser çavkaniyên avên li deştên bajarên mezin û bajarên din de. Di dawiyê de pîrsiyara mezin çawaniya serhildana wê kirîzê ye, rejîma Îranê bona berxwedanîkirina li hember kirîza mezina avê pîlanên çawan hene?



Nerîna Lîderan



“Zelenskiy”

“Rûsiyê êrîşên berfireh bo ser Rojhilatê Ukrayên deşt pê kiriye.”



“Lukaşenko”:

Cîhan ber bi birçîbûnê ve diçe



“Muqteda Sadr”:

Tirkiye bi awayekî ne rewa û bê hincet axa Iraqê bombardûman dike



“Ned Price”:

Îranê mezintirîn piştevanê terorîzm li cîhanê ye.”

Almanî ji Îslama Siyasî aciz in



N: Eskender Ceiferî

Di demên derbasbûyî de li Almanyayê biryar hatiye şandin ku, mizgeft bikarin dengê bangê li derve bilind bikin.

Vê biryarê jî, dengê civaka Almanî bikind kiriye û ew dibêjin li vir Misilman jî dikarin bijîn lê, ew ji Îslama siyasî hez nakin.

Beriya niha jî dengê wan li hemberî hin êrîşên tundrewên Îslamî derketibû.

Roja 4`ê meha Çiriya Pêşîn a sala 2020`an jîn û zilamek hevregexwaz li navenda bajarê Dresdenê raştî êrîşê hatin ku, di encamê de yek ji wan li nexweşxaneyê jiyana xwe ji deşt da. Ev kiryar û sedemên wê, beriya niha ji aliyê hêzên ewlehî û polîsan ve weke gefên îslamîtiyê hatibûn binavkirin.

Roja 16`ê Çiriya Pêşîn a 2020`an mamosteyekî dîrokê ji aliyê îslamgîrek 18 salî ve li Conflans-Sainte-Honorine li bakurê rojavayê Parîsê hate kuştin. Ew ji ber nîşandana karîkatoreke Mihemed hate kuştin ku di kovara Charlie Hebdo de hatibû belavkirin.

Wî mamosteyî li ser mijara azadiya nerînan bi xwendekarên xwe re gotûbêj kiribû lê belê resmandina Mihemed ji dîtingeha şerîeta wan ve qedexe ye. Di encamê de jî bavê xwendekarekê û tundrewê îslamgîr Fetwata kuştina wî mamosteyî dan.

Roja 29`ê Çiriya Pêşîn a sala 2020`an 3 kes li kilîsayekê li Nizza hatin kuştin û 6 kes jî bi tundî hatin birîndarkirin. Tawanbar piştî ku hate girtin, hewara “Ellaho Ekber” hilda. Mezintirîn rêxistina sîvil ya



Almanya ku wek Hevalbendnê Çep tê naskirin, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihand ku ew lîdîjî belavbûna Îslama Siyasî ne û ew dixwazin rê li ber belavbûna Îslamê li wir bê girtin.

Wan di deştpeka daxuyaniya xwe de gotin ku em pir ditirsîn ji ber ku, xelk bi sedema hizrên nemirovane tene kuştin. Em aciz in ji ber ku ti rexneyek nayê girtin.

Jin û zilamek hevregexwaz li Dresdenê raştî êrîşê tîn lê belê, ti kesek dengê xwe hilnade. Serê mamosteyekî li Fransayê tê jêkirin lê dîsa jî hemû bîdeng in. Êrîşek li Nizza bi kêr yan jî satorê hatiye kirin lê belê heya niha di derbarê wê de ti tiştê nehatiye gotin. Bîdengî heye ji ber ku rê nayê dayîn bi mafên kesên din bileyîzin.

Em li vir dibêjin: Êdî bes e! Hevalbendên Çep di beşeke din ji daxuyaniya xwe de gotin ku em naxwazin bîdeng bimînin û lewma jî bi awayekî eşkere dibêjin: Îslamgîrî, li dijî mirovahiyê ye.

Kuştinên heftiya derbasbûyî jî, ji vê yasayê cuda nebûn. Ew jî bi armanca pêkanî û bikaranîna tundrewiyê bûn ku ji aliyê hin kesan ve hatin encamdan û di encamê de hin kes, ji mafên xwe yê mirovahiyê tîn bîparkirin.

Di berdewamiya daxuyaniyê de daxwaz ji Almanyayê tê kirin ku ne pêşiya Îslamê, lê belê pêşiya tundgiriya bigire û dide xuyakirin ku divê li hemberî tevahiya wan kuştinan bi awayekî eşkere bi axivîn ku

bi hizrên tundrewane hatine encamdan: Ti bikujek, ji bikujekî din adiltir nîn e, ti qurbanî ji qurbanîyên din nêzîktir nîn in ji bo ku bibin armanc. Dijatiya mirovahiyê, terorîstên raştgir û bikujên îslamgîr kirine hevalbend. Kereb û kîn ji şariştaniyetê, azadî, demokrasî û mirovbûn. Qurbanîyên van raştîyan jî hebvgirtî dibin ku mafê sereke yê jiyana wan, ji wan hatiye şandin.

Xuya ye êdî Ewropî dixwazin bi rengekî cidî li hemberî terorê derkevin.

Ew didin xuyakirin ku heke em bixwazin bi awayekî berdewam ji bo civakeke azad, ji bo mafên mirovan di asta cîhanê de û ji bo jiyanekê baş xebatê bikin, nabe bi ti awayekî li hemberî kuştina xelkê bê deng bimînin. Divê dengê xwe hildin û wek pêkhateyeke çepgir, nerazîtiya xwe nîşan bidin. Hekî bikuj îslamgîr bin, divê em bikarin Îslamê rexne bikin.

Di beşa dawiyê ya daxuyaniya Hevalbendên Çep de hatiye, her kesê ku Îslamî be, terorîst nîn e lê belê ew dixwazin pêşiya Îslama Siyasî û tundgiriya bê girtin û tekezê dikin ku hekî em bê deng bimînin, wê demê em nikarin îdiaya azadiya cîhanî bicî bikin. Em weke projeyeke dijberên faşîstan, bi rengekî eşkere li hemberî her cureyeke bîbextiyê, helwesta xwe nîşan didin. Herwisa bi qurbanîyan re û bi wan kesan re ku hizrên mirovkujîyê bandor kirine ser wan, hebvgirtî ne.

Derfetek din



N: Ebdûlazîz Qasim

Îro piştî derbasbûna bêhtir ji 11 salan ji deştpêkirina kirîza Sûriyê û heta niha, pêdivî bi wê yekê heye, ku siyaseta kurdî di van 11 salan de binerxînin û deştê xwe danin li ser êş û birîna miletê kurd, ku kurdan di heyamê van salan de gelek derfetên zêrîn jideşt xwe dane.

Wekî dizanin ku pirs a kurdî li Sûriyê di nav civînên navdewletî de yên girêdayî Sûriyê, wekî pirs a miletekî xwedan taybetmendiyek neteweyî cuda nehatiye gotûbêjêkirin, ne di Cinêv û Aştana de û ne jî, di bîryara 2254 û komîteya deştûrî de.

Dibe ku sedemên vê yekê, vegerin li ser hin sedemên navdewletî û herêmî, lê helbet sedemên navxweyî jî hene, ku PYD wekî partiyek deşthilatdar li ser beşek mezin ji qada kurdîstana Sûriyê, ti bawerîya wê bi pirs a neteweyî nîne, hevdem ku ENKSê, tevî beşdariya wê di danûstandinên navdewletî de û tevî gotara wê ya neteweyî nikariye bibe nûnerê raşteqîn yê pirs a kurdî.

Bi bawerîya min, ti berjewendiyek kurdî ya neteweyî bi awayekî girîng nîne di pirojeyên niha de yên ji aliyê rêjîm û opozisyonê ve tene pêşniyarkirin, herwisa heta ti berjewendiya kurdî nîne di pirojeya “desentralîzasyon” de bêtî danpêdan bi ştatuyek kurdî, zêdebarî ku pirojeyê “bî-ratîya gelan” wekî xepandî û berovajîkirina ji pirs a kurdî re ye û pirs a kurdî bi



ti awayî bi rêya wê çareser nebe û herwiha tevî girîngiya beşdariya nûnerên ENKSê di Cinêvê de jî, lê hêvî li ser

wan civînan nayên girêdan, bi taybetî komîteya deştûrî ku yek ji encamên civînên Aştana ye bi beşdariya heryek ji Tirkîyê û Îranê.

Dîsa bi dîtina min, piştî peydabûna kirîza Ukrayna, xuyaye ku pirs a Sûriyê bi giştî wê bi radeyek mezin paš bikeve, ku ev yek ji bo aliyên kurdî dibe derfetek zêdetir ji bo sereraştirina siyasatên kurdî yên şaş û çewt, herwiha dibe derfet ji bo bihêzkirina îradeya kurdî û dîtina bijar-edeyên alternatîf, ku kurd dikarin gaz û petrola xwe wekî karteke fişarê li hember rêjîmê bikar bînin, hevdem ku opozisyon nemaze ya girêdayî Tirkîyê parçe dibe û ji aliyê gelek rêxistinên mafên mirov yên navdewletî û xwecihî bi tawanên şer û dijemirov li navçeyên dagîrkirî Efrîn, Girêspî û Serêkaniyê tê gunehbarkirin, û li vir dixwazim balê bikişînim li ser raporta salane ya wezareta derve ya USA ya ji bo sala 2021'an, ku tede rêjîma Şamê, DAÎŞ, opozisyon û çeteyên Tirkîyê û di nav de Tirkîyê jî bi tawanên dijemirov derheqa miletê kurd gunehbar dike, ku ev yek bi xwe rêxweş dike li pêşîya nûnerên kurdan ji bo qutana dergehên NY û saziyên wê û gotûbêjêkirina pirs a kurdî bi awayekî serbixwe ligel aliyên pêwendîdar bi krîza Sûriyê, bi taybetî ligel Amerîkiyan û Rûsiyan, lê mixabin ku heta niha ti asoyek yan hewldan û îradeyek raşteqîn ji bo yekrêziya kurdî û herwisa ji bo serraştirina siyasat û dîplomasiya kurdî peyda nebûye, lê mixabin ku kurd zêrekin di jidestdana derfetan de, herçend ku feylesofê kurd Melayê Cizîrî di helbesta xwe jidestdana derferan heram kiriye, dema di parçehelbestekî dibêje:

“Tali” ku bêt û furset, muhlet li nik heram e

Min ‘umrê Nûhî nîne, Saqî were bilez xweş”.



Ev hêza ku di şiyana wê de ye guherinkarî bike



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

Min gotara derbasbûyî de behsa rewşa jinan di demên şer û pevçûnan de kir, vê carê axavtin li herdeq azadiya civakê de ye ku, divê pêver azadiya jinê be ku, mil bi milê mêran in, pirs eve ku gelo dema vê hatiye ku jin enya xebat û têkoşîna xwe ji vê berfirehtr bike ya ku niha heye? Gelo dema vê hatiye ku jin bi awayek bivêrane li rola duyem û pileya duyem û herwisa bicihê sîberê bibe bi yaxî û îsyankar?

Ezmûnên cîhana pêşkevtî ev yeka ji me re yek alî kiriye ku, ti şoreşekî mêrane bi bê beşdariya jinê, tevahiy encama civakê nepêkaye, daşkilandina jinê li cihê xwe de sebeba şikesxwarina şoreşê ye, eger li dîtingeha mêran vê bi serkevitn pênase bikin jî.

Çimkû guhertina desthilata hukimran bi desthilateke din a hukimraniyê nabe bibe armanc belkû, guhertina tevahiya sistêmê ye ku, dibe

jin li hûndire de rola bandordar bilîse çimkû armanca sereke eve, ji bona vê ku piştî bi bê minet mafên xwe desteser bike û bi ked û têkoşîna xwe pile û dereceyên xwe werbigire û xizmetê bike. Çimkû, dagîrkerî tenê di polîtîkayê de nîne belkû, dagîrker tev jiyanê dagîr dike, di tev aliyan de çavdêriya neteweyên bin dest dike, her ji ber vê sedemêye demaku şoreş geş dibe, armancên şoreşê tenê di desthilatdariyê de kom nabin.

Belkû, şoreş dibe netenê standina kursiyên desthilat, warê aborî, serwet û saman û hêza çekdarî be belkû, şoreş dibe civakî, exlaqî û kultûrî be. Şoreşek qevareya exlaqî û cîhan bîniya civakekê danekute şoreşeke netewav e.

Di Rojhilata Navîn de yek ji girîngtrîn sedemên şikestên şoreşan, wedigere bo amade nebûna jinan di nav şoreşan de ye ku, bingeha vê yekê wedigere bo edet û dîtingeha pergala civakî û eşîreyî ku, jin weke canlibereke lawaz û destpaçe û çarçavîbûn pênase dike.

Şoreşeka ku tenê mîr vê hilde encama vê avakirina bingeha civakekê ye ku, tev warên jiyanê di vê civakê de li destê mêran de kom dike.

Helbet, beşdarîkirina li şoreşan de tenê rakirina çekê nîne belkû, beşdarîkirina di nav şoreşan de şewazên pir hene ku, mixabin li hûndrî civaka me de weke stratîjiyek jin hatiye dîr xistin bona vê ku, di paşerojê de di wê civakê de ti tiştêkê bi dest xwe nexîne.

Jinên ku amade nebûna wan dinav şoreşê de diyar nebe, azadiyeke netewav a wan di nav a vê civakê de jî, hedibe û rastî dijwarî û zehmetiyên bê sînûr dibin, û herwisa piştî şoreşê bona bideştveanîna mafên xwe ser nekevtinê bideşt tînin, ku virda bibin bi hêzeke bandordar di hewl û têkoşînên xwe de bona guhertina civakê çimkû, ev şoreşa ya mêran e, destkevten vê jî en mêrane û her bi vê sedemê ye ku tev warên desthilatê tenê mafê xwe dizan e.

Ji aliyekî din ve jî, beşdar nebûna jinan di şoreşên tev alî yên civakî de, bilî ji vê ku wan li desthilatê dîr dixîne, û herwisa dibe rê xweşker jî bona serhildan û dakutana reh û rîşeya piraniya nîşaneyên olî û radîkal ku mebeşt wan jî, jin li bazneya birêve birina desthilatê û herwisa biryar standinê de dîr bixînin. Ji aliyekî din ve jî, mafê wê dide bi mîr ku li seranserê bazneyên

desthilatê de her ev bibin bi berdevkê jinan.

Ev jinên ku dernakevin û li derveyî malên xwe de mafên xwe daxwaz nakin, ev cîhanê li dîtingeha mêran de dibînin û wan mafan wedigirin ku mîr didin bi wan, bi kurtasî çimkû wan tu beşdarî û amadebûna xwe di civakê de nebûne û nînin, ji ber vê ku ew nevêrin daxwazkariyên ji vê zêdetr bikin ku mîr didin bi wan. Ev jinên ku azadiyê di mijarên dapoşandin û tijî vala de dibînin mafê wan tune ye ku daxwaziya zêdetr ji wan mafan bikin mîrên wan didin bi wan. Çimkû, te bixwe xebat nekiriye û têkoşîn nekiriye, her ewqas verdigirî û ti carî ev tişt dest te nakeve ya ku tu xewnê pê ve dibînî.

Di dema aştiyê de mebeşt ji şoreşê eve em tev wan erkan encam bidin ku mîr wan encam didin, ev maf me hebin ku mêran hene, bona vê ku bikarin mil bi milê mêran rola bandordar di guhertina civakê bilîsin. Di dawiyê de azadî tenê ev maf nînin ku, em wan daxwaz dikin belkû, ev erkin jî ku, dibe em wan bicih bînin bona vê ku, şiyana û lêhatîbûna xwe nîşanî regeza beramber bidin, ev hêza ku di şiyana de heye weke mêran guherîkariyan di civakê de pêk bînin.

Hevpeyvîna digel hunermend Kawe Urmiye beşa 2

P: Huner di nav Kurdistanê de çiqas girîng e?

B: Huner di nava Kurdistanê de bê guman girîngî û babetên wê gelek û watedarin û rêbazên vê yên pîroz hene, huner di nava Kurdistanê mirov dikarî wekî evîn wekî ceng wekî eşîq pênase bike hunera resen hunera şoreşgêrî hunera berxwedanî hunera ku herdem û her gav di sengerê paraştina destkevtiyên gelê kurd paraştina xak û nîştîman û gel di vê mevziyê de cihê xwe girtiye, bêguman di nava Kurdistanê

de gelek watedare, taybet hunermedên ku di nava hûnerê, ku eş û jana gelê xwe hîs bike û bi gelê xwe rabe û rûnê û wê jî bi gelê xwe raya giştî parve bike, bi wî awayî em dikarin bêjin ciyê hunerê di nava Kurdistanê de gelekî taybete hunera resen wêjeya resen ji ber ku bi hunerê mirov dikare têkoşîn kesayetî xizimata ku ji bo paraştin ji bo azadî ji bo wekhevîyê ji bo biratiyê têkoşînê dike mirov dikare vê hunerê bi rastî di astekekî bilind de bi têkoşîn û xebata qehremanên ku xak û nîştîman û gelê xwe



paraştina bînin ber hevduyan bike qalibek yek bi navê huner yek jî bi navê berxwedanê mirov dikare bi wî awayî pênase bike, ji ber vê yekê huner di Kurdistanê de gelek girînge xebata ku bi awayekî berxwedanî çî di hûndir çî li derve, li hemberî dagîrkeran têkoşîna bêhempa tê kirin bi rihê hunerê tê xemilandin kemilandin diyarî gel û nîştîman û diyarî raya giştî tê kirin eve jî ku xalekî gelek girînge dibe

»»»» doma R:9

ku bi hunerê miro zû jî xwe bigihîjine gel ev jî rêbazekî wekî ragehandinekî mirov dikare bêje hîn bi leztire, çimkû ger mirov şiraneke bîstre di demekî kin de milyonana gelê me neteweya me raya giştî dikare haydar bike ji ber vê yekê mirov dikare bêje rola huner di Kurdistanê de rolekî pîroze û pîroz jî lîstiyê di dîrokê hetanî roja îro hem di warê marşî de hem di warê bîranîn û rêzgirtina nîrxên netewî de rolê xwe yê mezin lîstiyê heta roja îroke hunermend û huera Kurdî di nava Kurdistanê cihê xwe yê girîng heye nûjentir dibe xortir dibe geştir dibe xemil û kemilandina berxwdana ji bo azadiyê ji hêla têkoşerên azadiya Kurdiatanê ve bi rêya hunerê de têde bedevkirin tê xemilandin kemiland diyarî gel û nîştiman û xaka pîroz û raya giştîya Kurdistanê tê kirin.

P: Gelo Hunerê kariye li ser piroseya netewesazî bandordar be?

B: Bêguman hunerê bandorekê mezin kariye li ser piroseya netewesaziya xwe biket, ji ber vê yekê îro jî bi rêya hunerê gelek hunermendên Kurd li ser bingeha esas ku êdî teredûdî dudilî weswasî dilê kesê de nemîne, hunemendên Kurd bi hemû beşên xwe, dema em behsa hunerê dikin hemû beşên sînemayê bigire şanoyê bigire awazdanînê bigire helbest û şîran û bi her awayî bi her şikilên xwe yên pîroz bandorek mezin çêkiriye . Îro jî em dibînin li her çar parçeyên Kurdistanê hunermendên gelê Kurd bi bange-waziyên xwe taybet ji bo hêz û hereketên Kurdistanê gelek girîng bi dest gitine ku karnîbin ji bo hîn zêdetir avakirina yekîtiya netewa Kurdistanê di nava hewil danên giranbiha dabin, wiya belkî di wan salên dawiyê de hunermendên çarparçeyên Kurdistanê bi îradeyekê xorit bi raştî ketin qada derve û hûndir de jî di derweyî welat û di diyazpora yê de jî bi xebata xwe ev yek

dane nasîn.

mînak ew berhema ku li ser kesayetîya nemir şehîd Dr.”Qasimlo” jî me diyarî gelê xwe netewa xwe kir ev bixwe mînakeke herî giranbi-haye bo avakirina yekîtiyê ji bo netewesaziyê li ser erdnî-gariya Kurdistanê ji bo ku êdî em kanîbin pêkanîna wesiyetên pêşengên neteweya Kurdistanê ji nemir “Qazî Mihemed, Şêx Seîd, Seyîd Rîza, Mela Mîstefa, Qasim-loyê nemir, Şerefkendiyê nemir” û hetanî îro ku em bedelan didin wekî neteweya Kurdistanê ew wan wesiyetên wan pêkbînin hunermendên Kurd bi hunera xwe karîne bandorekî baş çê bikin û çêkirine jî, bêguman êdî ew sînor êd, rabûne û di nav me de nemane îro ew berhema ku ji bo bîranîn û rêz girtina nemir “Qasimlo” me çêkir û diyarî gelê xwe kir, ev bixwe mînakek giran bihayê ji ber ku, kesayetiyên wuha pîroz bingeha esasa avakirina yekîtiya neteweya Kurd in, kesayetiyên wuha nemir û pêşengên serdemîne ji bo vê yekê, bêguman hunermendên kurd jî rêbaza kesayetiyên wisa pîroz dilxwaziya wan wesiyeta wan ji bo karîbin bicî bînin di nava hewildanên giran biha dane ku karîbin bigehîne armanc û encamên ku di nava vê pîrisê de li me tê kirin em dikarin bibêjin bigehîne de.

P: Gelo di îro de Hunermendên Kurd hewce ye bo nîştiman sazî û netewesazî çi karek hevpar bikin?

B: Ez dikarim bibêjim hunermendên kurd îro bo ku neteweya xwe bînin cem hevdu ji bo ku karîbin bibîne wesileya avakirina neteweya Kurdistanê û tişta ku ji destê wan tê dikin. ev xebatên me hina jî berdewamin mînak em dikarin bêjin li car parçeyên Kurdistanê de hunermendên navdar yên kurd yan dema ku em behsa hunermendan dikin hunermendên ku dinav êş û janên gelê xwe de ne û hunemrnedên ku bi xebatên rojane bi xebatên yên hem hunerî û hem jî danûstandinên digel hêz û hereketên kurdistanî de calakvanin. ya din ji dinav

gelê xwe de bi awayekê fermî dinav têkoşîn û xebatê de ne, çi carî xwe ji têkosîna neteweya xwe bi hemî reng, şikl û şemayilên wê dûr naxînin. Em behsa wan hunermendan dikin bêguman em hunermend karîbin bibin dilopek ji bo avakirinê ji bo wekhevîyê ji bo biratîyê ji bo ku ev pîra pîroz dinavbera hêz û hereketên Kurd de çê bikin ev hunermendane xebateke mezin dikin bi dilsozane nezîkî nîrxên xwe dibin dilsozane daxwazên xwe hene gelek caran ji reya capemeniyê, danûstandinên me çê bûne, xebatê me heta roja îro jî berdewamin digel hêz û hereketên Kurd de. Ev daxwaza her hunemrnedekî dilsoz û xwedan wêjdane yê ku dinav êş u janê gele xwe de radîbin u rûdine u dixwazin bighene we daxwaza xwe ku ewv ji biratîya taybet ya hêz û hereketên Kurdistanî û avakirina yeketiya neteweyî ye ku, em karîbin ji wê kul û êş xemane û wê kocberiyê xelas bibin û li ser axa xwe û li ser welatê xwe bi awayekî tê xwaştin em ji bihevîre bijîn û jiyan bikin û bo pêşeroj û parseroja nîfşên xwe karîbin bingeheke esas dabimezirînin.

P: Gelo te niha çi berhem ber dest hene ku di paşerojê de bikî mûzîk û vîdiyokilîp?

B: Bêguman xebata me herdem berdewame û dê berdewam bibe jî, û gelek berhemên pîroz di destê me de hene. Berhemên me tu dizanî destpêkê xemla welate û ya din ji kesayetî û têkoşerên azadiyê di çar parçeyên kurdistanê de ku bûne stûna berxwedanê di bin esmanê welatê me de û şerbeta şehadetê vexwarine. Gelek kesayetiyên wisa pîroz di nav berhemên me de weke temsîlyeta hemû can goriyên Kurdistanê de hene ji bo xemlandin û danasîna wan dinav berhemên me de hene, emê hewl bidin bi rêzdarî dîsan bibîr bînin berhemên din ku di destê me de hene di demek nêzîk de emê diyarî gelê xwe bikin, albûma bi navê Bihuşt Evînê emê diyarî gelê xwe bikin dîsan gelek berhemên pîroz di her

çar parçeyên Kurdistanê xebatek wisa me heye, di dem kûrtiyê de emê diyarî gelê xwe bikin heta ku ji destê me bê emê hewl bidin hîn zêdetr di warê xebat û xizmeta xwe ya hunerî xwe di asteke de ku hêla ji me tê xwaştin emê xwe amade bikin gelek berhemên pîroz hene wê mîzgîniyê dikarim bidim di demek nêz de emê wan berhemên pîroz û xemila welat nîrxên giran biha yên kesayetiyên pîroz destkevtiyên gelê xwe bi wêje û edebiyatek pîroz ku, di arşîvên nemiran de cihê xwe bigirin emê diyarî gelê xwe bikin bêguman em dikarin bêjin tiştên ku me hîn zêdetr bihêztr dike di warê hunerî de, ew ji xwedî derketin û piştgiriya çapemenî û ragihandinên kurdistanî û hem jî xwedî derketina gelê me.

Em dikarin virda dîsan dubare bikin ku xwedî derketina gelê me ji hunermendên xwe yên dilsoz û birehit şoreşgirî tevdişerî, bila kême nebe ji ber ku em ji xizmetkarê gelê xwe ne heta ku, ji destê me bê wê xizmeta destê me ji me tê xwaştin emê hîn zêdetr bikin û me ji karîbin layqy gelê xwe ye serhildêr u berxwedêr derbikevin û di dawiyê de ji dîsan gelek spasiya rojmaneya Agiriyê dikim û ez bixwe yek ji xwandevanê wê me keyfxweşim dilşadim ku ev derfeta dane me û me karî hinek bersivên pîrsên we yên giran biha bi kûrtî be jî me karibe bibersivînin newroza gelê xwe bi rêya rojnameya Agiriyê carek din pîroz dikim, hêvîdarim ev cejna bibe wesileyekê yekîtiya neteweya Kurdistanê û bitaybet hêz û hereketetên Kurdsitanê. Hunermend û rewşenbîrên kurdistanê bi her awayî carek din cejna Newrozê li malbatên şehîdên Kurd û kurdistanê kesayetîya nemir dr. Qasmlû û şehîdên 10`ê Xwaketelêweyê em wan pîroz û bimbarek dikin û em dibêjim serbilindî û serferazî herdem û her gav para gelê me be û bi hêviya rojên xweş û geş û azad û ez gelek keyfxweş bûm bo vê derfet û îmkana we û keke Hesên hûn her hebin serkeftin bo we serefrazî bo we hûn her hebin.

Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

Kolberek li ser sînorê “Bêtûş” ê ser bi bajarê Serdeştê bi teqeya hêzên leşkerî canê xwe ji dest da

Êwara roja Duşemî 29ê Xakelêwe, kolberek Kurd ê bi navê “Silêman Îbrahîmzade”, temen 37 salî û xelkê gundê “Binûxelef” ê girêdayî bajarê Serdeştê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li sînorê “Bêtûş”ê canê xwe ji dest daye.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Bêtûş”ê bi bê agehdarkirina berê “Silêman Îbrahîmzade” di dema kolberiyê de dane ber gulleyan.

Ew kolbere xêzandar û bavê zarokekê ye.

Di vê derheqê de, êvareya roja Yekşemî 28ê Xakelêwe, hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorên “Newsûd û Şûşmê”, teqe li hejmarek ji kolberan kiribûn ku nasnameya 10 kes ji wan kolberan bo Ajansa “Kurdpa”yê eşkere bûye û herwisa çendîn kolber jî birîndar bibûn.

Hejmarek ji kolberan li ser sînorê Newsûd û Şûşmê hatine birîndarkirin

Êvareya roja Yekşemî 28ê Xakelêwe, hejmarek ji kolberan li ser sînorê Newsûd û Şûşmê rastî teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî yên hikûmetî hatin û di encamê de çend kolber hatine birîndarkirin.

Nasnameya çend kes ji wan kolberên birîndarbûyî, bi navên “Hesîb Ezîzî” xelkê gundê “Şimşêr” yê girêdayê bajarê Pawê, “Sasan Xanî” xelkê Selasa Bawacanî û rûniştîyê bajarê Ciwanroyê û “Hebîb” xelkê gundê “Şirwîne” yê girêdayê bajarê Ciwanroyê, Se’idullah Husênî, Namdar Husênî, Mubîn û Mêhdî xelkê bajarê Ciwanroyê hatiye ragihandin.

Hêzên leşkerî yên hikûmetî bi bê agehdarkirina berê li ser sînorê Newsûd û Şûşmê ew kolberane dane ber gulleyan.

Ew kolberane bi sedema berkevtina gulleyên saçmeyî ji aliyê dest, situ, sîng, ser, pişt û pêyên xwe ve birîndar bûne û bo tedawiya pizîşkî bo navendên dermanî hatine veguhaştin.

Çalakvanek Kedkarî yê Kurd piştî 5 roj ji binçavkirinê hêj qedera wî nexuya ye

Çalakvanek Kedkarî yê Kurd yê bi navê “Murteza Seyidî” temen 37 salî û xelkê bajarê “Kamêran” û rûniştîyê bajarê “Tehran”ê piştî 5 roj ji binçavkirinê hêj qedera wî nexuya ye.

Ew Çalakvanê Kedkarî roja Înê 26ê Xakelêwe digel 5 çalakvanên din li bajarê “Tehran”ê hatibûne binçavkirin.

Ew Çalakvanê Kedkarî bi bê hebûna ti belegeyek yasayî hatibû binçavkirin.

Çavkaniyek agehdar û nêzî malbata “Seyidî” bi Ajansa “Kurdpa”yê re ragihandiye, tev hewilên malbata wî çalakvanê kedkarî bo agehdarbûn ji çarenivîsa navbirî bê encam maye.

Herwisa wê çavkaniya agehdar basa vê yekê jî kiriye ku hevjinê wî çalakvanê kedkarî ya bi navê “Zara Sadiqî” roja Duşemî 29ê Xakelêwe, serdana îdareya Îtîlaat û polîsên ewlehî yên bajarê “Tehran”ê kiribû, lê ti zaniyariyek li derheq qedera hevjinê xwe bi dest nexistibû.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê ti navendek ewlehî û dadwerî berpirsariyê binçavkirina wî çalakvanê kedkarî nekişandine situya xwe û eva jî bûye sedema nîgeraniya malbata navbirî.

Hejmarek ji kolberan li ser sînorê Newsûd û Şûşmê hatine birîndarkirin

Êvareya roja Yekşemî 28ê Xakelêwe, hejmarek ji kolberan li ser sînorê Newsûd û Şûşmê rastî teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî yên hikûmetî hatin û di encamê de çend kolber hatine birîndarkirin.

Nasnameya çend kes ji wan kolberên birîndarbûyî, bi navên “Hesîb Ezîzî” xelkê gundê “Şimşêr” yê girêdayê bajarê Pawê, “Sasan Xanî” xelkê Selasa Bawacanî û rûniştîyê bajarê Ciwanroyê û “Hebîb” xelkê gundê “Şirwîne” yê girêdayê bajarê Ciwanroyê, Se’idullah Husênî, Namdar Husênî, Mubîn û Mêhdî xelkê bajarê Ciwanroyê hatiye ragihandin.

Hêzên leşkerî yên hikûmetî bi bê agehdarkirina berê li ser sînorê Newsûd û Şûşmê ew kolberane dane ber gulleyan.

Ew kolberane bi sedema berkevtina gulleyên saçmeyî ji aliyê dest, situ, sîng, ser, pişt û pêyên xwe ve birîndar bûne û bo tedawiya pizîşkî bo navendên dermanî hatine veguhaştin.

Wêne: Bi dawîhatina dewreyek taybet a Hêza Pêşmerge Kurdistanê

